

PIRS

Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye.

- Pêşgotin :	2
- Parastina zaravên Kurdî	Merwan Berekat 4
- Seredana hozanekî	Rozad Elî 7
- Tirbesipiyê.. cih û warê gernasan..	N.Bêçirmanî & D.Deştî... 11
- helbestvan Hejar	pertewê Şerqî... 18
- Stranbêj Omerê Cemlo	Arif Tisorî ... 20
- Têbîn di warê rênvîsa Kurdî de	Rozad Elî ... 22
*Kurteçêrok	
"Çûkek û	Narîn Omer ... 25
- Ew kîn e?	Bavê vînyar ... 27
- Toxtir Axa	Dr. Ebdilmecît Şêxo ... 29
- Keça hişmend	Mihemed Q. Hesên .. 31
*Helbest:	
- Pêdarî	Merwan Berekat 35
-Dayîkbûna Evînê	Pertewê Şerqî ... 38
- Dayê	Bêrîvan ... 39
- Serpêhatiyek	Dr. Mihemed. Elî... 40
- Pêkenokên gelêrî	Şêrewî 42
- Darên Hêvirzê Ê Erzê	Mihemed Tobal 43
- Telqîna miriyan	Rozad ... 45

kovarapirs@yahoo.com Buha (75) L.S

Pêşgotin :

Di pêvajoya şaristaniya nûjen de, û bi bilindbûna têgeha mirov, pêdvî bikaranîna bêjeyên nû çê dibe. Li ba civakên pêşketî ku ew şaristaniya hevdemî dafrînin, pirsra binavkirina tiştên afrander zû çareser dibin. Lê li ba civakên ku li şûn karwana şaristaniyê mane, pirsgirêkên zimanî yên mezin derdikevin holê û bigerekî çareseriyê dibin. Wek nimûne, dema ku dewleta Osmanî têkçû, û dewletên Erebi hatin damezrandin, zimanzanên Ereb bi sedan bêjeyên Tirkî û yên biyanî ku li serdema Osmanî bi kar dihatin, wergerandin Erebi û xebitandin. Ew guherîna bêje û têrman di gelek waran de çê bûn, mîna: Binavkirina pileyên serbaziye, navên alavên nû, navên zanistî, navên xwarin û vexwarinê û hwd. Gelek ji ew bêjeyên nû, cihê xwe girtin, ra niha bi kar tên û bûn ji sermiyana zimanê Erebi, hinan jî cihê xwe negirtin û hatin jibîrkirin.

Li ba Kurdan jî tevgera wilo çê bû bû û hîn jî berdewam e. Zimanzan û nivîskarên zimanê Kurdî jî, pêkol dikirin da ku zimanê Kurdî ji pêvajoya pêşketinê nemîne, loma jî hewldanên berdewam hene da ku zimanê Kurdî ji bêjeyên biyanî "paqij" bikin, û li şûna wan, bêjene çêkirî ji bo binavkirina têgeh û afrandeyên nûjen re bi kar wînin.

Bêguman, ev kar ji zimanê Kurdî re jî rewşa ye. Lê zor pêwîst e, ku ew kar û hewildan bi şeweyên zanistî û di çarçewa pergala û taybetiyên zimanê Kurdî de werin kirin. Loma jî, gereke merc û bendên wê babetê hebin û diyar bin jî, nexwe ew karê rewşa û pêwîst, dê ji zimanê me re bibe bargiranî û belkî kêmanî jî.

Di baweriyaya me de, zor pêwîst e, ku em di ev warê zimanî de, van xêzên stûr û sereke ji bîr nekin û ji çarçewa wan dernekevin:

- Bêjeyên Kurdî yên ku berê bi kar tên, werin parastin û bikaranîn.
- Bêjeyên biyanî "Erebî, Tirkî, Farisî...", ku roja îro di zimanê me de bi kar tên, eger berdêlên wan di çî zaraveyên zimanê me de hebin, gerek e ew werin bikaranîn.
- Zor pêwîst e, em bi saziyên perwerdeyê û nivîsê yên Başûrê Kurdistanê re têkildar bin, ji ber ku ew dê di warê zimên de li pêş bin û zû jî pêşde herin.
- Eger ev her sê warên jorîn têrê nekirin, wê hingê em kanin ew bêjeyên biyanî ku di zimanê me de hene, bi şêweyekî zanistî wergerînin zimanê Kurdî bixebtînin. Yan jî eger bêjeya biyanî cihê xwe di zimanê me de girti be, û ji pergalên wî nareve, ne şaş e, ku ew bêjeye wek heyê bi kara were, ew jî tiştekî normal û hîç ne şaş e.

* * *

Li rojên 2-3-4 ji meha avdara 2012an, konferanseke taybet ji bo zimanê Kurdî li Amedê (Diyarbekr) hat girêdan. Gelek zimanzan û saziyên zimên lê amadebûn û gotin û lêkolînên hêja tê de xandin. Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê jî hatibû vexandin. Li ser navê saziyê mamoste Merwan Berekat ev gotar ji konferansê re şand.

Parastina Zaraveyên Kurdî

Berî her tiştekî silav û rêz ji hemî beşdarên hêja re.

Spasiyek taybet ji komîta rêvebir re, ku Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî vexandiye ev konferansê hêja. Germtirîn rêzdarî ji bo hemî kesên, ku di xwendin, nivîsandin û perwerdekirina zimanê Kurdî de xwe diwestînin.

Beşdarên hêja: Wek çawa ziman beşeke ji mirov e, û jiyan bê ziman nabe, her weha ziman jî bê zaraveyan zengîn û dewlemend nabe.

Wek çawa çemên mezin pirobar in, her weha zimanê Kurdî jî zimanekî pirzarav e.

Di dema îro de zimanê kurdî gelek hewcedar e, ku em li wî xwedî derkevin, divê bi şêweyekî zanistî em di jiyana zimanê xwe de bixebitin. Bê guman xebat di jiyana zimên de, bê xebata di warên jiyana zaraveyên zimanê Kurdî de zor dijwar e, ji ber ku zimanê Kurdî zimanekî pirzarav e, û her zaraveyeke wî jingehêke taybet jê re heye.

Di dirêjya diroka Kurd û Kurdistanê de, bandrorên gelek zimanên biyanî li ziman û zaraveyên zimanê Kurdî bûne, wê ûştê jî ziman û zaraveyên Kurdî pitirîni hemû zimanên cîhanê hewcedariya lêkolîn û vekolînan e. Piraniyên gelên cîhanê wan ji zû ve lêkolîn di jiyana ziman û zaraveyên zimanên xwe de çê kirine, wan her tim zimanên xwe li gor demê serest û nûjen kirine, û hin ji wan zimanan îro bûne zimnên cîhanî. Nimûne: Zimanê Îngilîzî.

Rast e zimanê Kurdî ji zû ve ne bûye zimanê sazî û dezgehên dewleteke serbixwe, û her tim şerê wî bûye, lê dijminên gelê kurd nikanîbûn rehên wî ji xaknîgariya Kurdistanê hilqetandana, ne jî kanîbûn ew ji jiyana

Kurdan dûrxsitana, her ku ji bo tunekirina wî şer gur dikirin, ewqasê wî lengerên xwe yên zimanî di jiyana Kurd û Kurdistanê de kûr berdidan.

Belê gelê beşdarên hêja û delal, pêdariya zimanê Kurdî ji pêdariya hemû zimanên cihanê bi hêztir û dirêjtir e, û gelek sedemên vê pêdariyê hene, pîrzaravên wî yek ji wan sedeman e, wê lomê jî divê em bi her awakî zaraveyên zimanê Kurdî biparêzin, ta ku em kanîbin encama wê parastinê wergirin, divê em bi bend û dîwarên zanistî zaraveyên zimanê Kurdî dorpeç bikin, û wan ji liberhevdanên zimanî biparêzin.

Di vî warî de gelek rêbaz hene, ku em bi wan zaraveyên zimanê Kurdî biparêzin wek: Damezrandina sazî û komeleyên taybet, ji bo lêkolîn û vekolînan di jiyana zaraveyên Kurdî de bîn çêkîrin. Divê mafdayîn ji hemû nivîskaran re hebe, ji bo nivîsandina bi hemû zaraveyên zimanê Kurdî, û tucarî ne şaş e, ku di kovar û rojnameyên Kurdî de gotar û berhemên curbecur bi gelek zaraveyên zimanê Kurdî werin nivîsandin û weşandin.

Beşdarên birêz: Ji ber ku ta îro yek zimanî Kurdî yî nivîskî ne hatiye erêkirin û danîn, ne jî zaraveyekî ji zaraveyên zimanê Kurdî bûye zimanekî fermî û stenderd, kesek nikane bêje bila berhemên zimanê Kurdî yên nivîskî bi zaraveyêke zelal bêne nivîsandin, ne jî kesek kane bêje berhemên, ku bi zaraveya Soranî hatine nivîsandin, ji berhemên zaraveya Kurmancî, an ji yên zaraveya Zazakî dewlementir in.

Li gor bîrdozên zimanzanînê dibêjin, eger di zimanekî de gelek zarave hebin, ji wan zaravan asta kîjan zaraveyê di warên zanistî de bilind be, û rewşenbîrên wî gelek bin, ew encama serkeftinê werdigre, û zora hemû zaraveyên din dibe. Nimûne ji bo vê xalê: Zaraveya Toskanî li Îtaliyayê, ji ber ku ew xwedî berhemên wêjeyî yên gelek bilind bû, di sedsala çardehên zayînê de, wî zor li hemû zaraveyên Îtalî yên bê berhem kir, û ew bû zimanê nivîskî.

Di zimanê Kurdî de, ji bilî zaraveyên serekîn di her zaraveyêke de hin zaraveyên din jî hene, wek zaraveyên herêmkî, zaraveyên civakî, û her yek ji wan xwedî deng û wateyên taybet e, yanê di deverekê de du sê zaraveyên herêmkî hene, û di civakekê de zêdetirî zaraveyêke hene,

ta em bi hûrikî bikanîbin jiyana zimanê xwe nas bikin, divê ji bo hemû zaraveyên wî lêkolîn û vekolînên zimanzanistî werin kirin.

Di parevekirina zaravayên zimanê Kurdî de newekheviyek heye.

Şeref Xanê BEDLÎSÎ wisa wan pareve kirine:

- | | |
|----------------------|--------------------|
| 1 - Zarava Kurmancî. | 2 - Zarava Lorî. |
| 3 - Zarava Kelhorî. | 4 - Zarava Goranî. |

Hin Rojhilatnasên Ewripî û lêkolînvanên Kurd zaravayên Kurdî wisa dabeş kirine:

- | | |
|---------------------------|---------------------------|
| 1 - Zarava Kurdiya Bakur. | 2 - Zarava Kurdiya Başûr. |
| 3 - Zarava Kurdiya Navîn. | |

Birêz Fûwad Hemê XORŞÎD zaravaya Kurdî wisa parve kirine:

- 1. Kurmanciya Bakur** = Beyazîdî, Hîkarî, Şemdînî, Botanî û zarava rojhilat.
- 2. Kurmanciya Navîn** = Mokrî, Soranî, Erdelanî, Silêmanî û Germiyanî.
- 3. Kurmanciya Başûr** = Lîrî ya resen (Feylî), Bextiyarî, Masanî, Kuhkilewî, Likî û Kelhorî.
- 4. Goranî** = Goraniya resen, Hewremanî, Bacelanî û Zazî.

Di baweriya me de, wan hemiyan ne bi şêwakî zanistî zaraveyên Kurdî dane nasîn, dê gelek baş be, eger zimanzanên Kurd ji bo parvekirina zaraveyên Kurdî hin lêkolîn û vekolînên zanistî bikin.

Beşdarên hêja: Hêvî û armanca Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Kurditana Rojava ew e, ku di rojek nêzik de konfiranseke firehtir ji bo zimanê Kurdî were lidarxistin, û hin komît û komlgêhên şopandinê ji bo hemû warên jiyana zimanê Kurdî werin damezirandin, ta em kanîbin derd, pîrsgirêk û êşên zimanê xwe derman û çareser bikin. Dê gelek baş be eger karên wisa girîng û hêja bi hevkarîya hemî saziyên zimanê Kurdî lidarkevin, karên weha dê zêdetiir sûdar û serkeftî bin, eger pispor, zimanzan û nivîskarên berhemdar ji hemû beşên Kurdistan têde beşdar bibin.

Serkeftin ji karê we yê girîng û hêja re.

Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî.
S . F . P . Z . K .

02 . 03 . 2012z.

Seredana Hozanekî Hozan "Şêx Arif"

Amadekirin: Rozad Elî

Hercara ku em diçin seredana dostê me Endezyar Mihemed Tobal li gundê Mu'riskê, me jê li ser "Şêx Arif" û huner û behrekînên wî yên remgereng dibihîst, û em dixwaz dibûn ku wî nas bikin.



Gundê Me'riskê gundek pir ciwan e, bi rik û **hunermend Şêx Arif** pêdarî xwe bi piştta Çiyayê Lêlûn ve perçîm kiriye, wekî ew bi hinekan re ku dixwazin wî ji cih hilkin di qerezê de ye, bi serhişkî pêkol dike ku bi zimanê rûnişvanên xwe, çand, serhişkî û pergalên wan yên Şikakî yên pir cidawaz bimînin.

Şêx Arif, ez û hevalê min nivîskar û helbestvan Merwan Berekat, û dostê me Mihemed, bi germî li ber deriyê mala xwe pêşwazî kirin. Min di dilêxwe de got, dêmek, ev e Şêx Arif!, erê rihên xwe sipî û sivik in, belkî destnîşana sinet û îmanê bikin, lê belê pergala wî ya tevahî destnîşana Şêxîtiya bi cil û foteya cidawaz ku xelk dizane nake!.

Rêzdar Arif li destpêka jiyana xwe di dezgeha polîs de mor kir. Piştî ku ew kar berda, di warên aborî yên din de xebitî. Ê piştî ku li gundê xwe vege'î, ji ber xwe ve di mizgefta gund de bû peyvkar. Pişt re karê Îmamtiyê bi dest xwe ve anî, fûte da serê xwe û çend salan li gundên navçaya Çiyayê Kurmênc bû Îmam û peyvkar, wî di karê xwe yê nû de doza hezkirinê, hevkarîyê û rastgoyiyê li xelkê

dikir û li destpêkê jî bi bi xwe re. Pişt re û berî çend salan fûta xwe danî û li gund vegeirî, lê vê carê wî binavkirina "Şêx" jî bi xwe re anî, ew binavkirina ku destnîşana zanîna olî û civakî dike, wê jê re şûna bidestxistina xwendina bilind girt.

Piştî ku li gund bicih bû, Şêx Arif vegeirî dilxwaziya xwe ya ku ji çûkaniyê de jê hez dikr, ango (wênasazî). Ew niha ji bilî ku wênesaziyê bi komirê, ew têx jî dinikirîne, helbestan jî dinivîse û kevir û latên tiştên çolê ên ku di bin bandora sirûştê de şêwene taybet û watedar standine ji hawîrdorê kom dike.

Dma ku Şêx Arif deriyê hewşê vekir, tiştê ku bala me kişand ew kevirên ku di bin bandora kirdeyên sirûştê şêwene bêgane û bi wate stande bû, hozan Şêx Arif ew bi renekî şêrîn li ser bingehên taybet bicih kirine, loma jî gava ku mera berve deriyê malê diçe, mera hestewar dibe ku di hundur entîkxanekê re dimeşe, û diyar dibe, ku digel jana tamarên dilê wî, ew hozan westiyaye, û behreke wî ya afranvanî jî diyar dike.

Şêwenîgarek (ê bi dû rûyan)



Berî ku em biçin seredana wî bi çend rojan, hozan Şêx Arif piraniya berhemên xwe yê hunerî, nemaze yê ku ji têxt hatine nikirandin di odekê de danî bûn. Ji ber bi alîkariya dostê me mamoste Mihemed û hin rewşenbîrên gund, pêşengeha yekê ji karên Hozan Arif re li gund hat vekirin, pêşengeh cihê pesnê bû, ew dibêje, wî ji dilgermî û hêz jê wergirt, nemaze li vê dema ku jiservekşandineke tevahî ji ser hemî cureyên çaneyê

heye, û çêştin û nirxandina huneran jî bi şêweye diyar bi şûnde çûye, ligel civaka gundî ya ku hunermend di nav de.

Şêx Arif darê Zêtûnê di nikrandina şêwe û pûtên xwe de bi kar tîne, di karê xwe de tenê alavên destan bi kar tîne. Wek tê zanîn, darê Zêtûnê jî gava ziwa dibe, pir hişk dibe û dipeqe, û herwiha nikrandina wî jî dijiwartir dibe. Lê digel wê yekê, bawerî û nêrîneke hunermedê me heye, dibêje: Ji bilî ku Darê Zêtûnê bi şêwe û girseya ku dixwaze li navçeyê peyda dibe, ez dixwazim di hunera xwe de dara Zêtûnê ku navça Efrînê di dîrokê de pê hatiye nasîn, terxan bikim.

Şêx Arif gelek pûtikên nîgarkirî yê ciwan û bi şewaz û girseyên têvel di pêşengeha xwe de pêşkêş kirine. Ew di karê xwe de bêtir bi rûyên mirov bendewar dibe, û şewene siryalî ku êş û zanîneke zelal ji aliyê sinciyî re diyar dikin didê. Wê nîgariyeke xwe bi "yê durû" bi nav kiriye, rûyê derve yê ku em pêş xelkê dikin e, yê di jî yê veşartî û rastî ye. Belkî jî wî ev nêrîna xwe ji herdu karên ku tê de xebitiye, ango: Polîs û Ol. Rola herduyan jî di afirandina aliyên sinciyî û silûkî de di civaka me ya herêmî de giring e.

Hunermend çend tabloyên şêrîn jî bi dar xisti bûn, wî telajên qamîş û gelek cure ji teneyên ku li herêmê hene bi rengên xwe



Tabloyekî zêtî ♦



Wênekêşî bi komirê

yên sirûştî bi tabloyê ve leziqandina, mîna nîsk, genim, garsê zer û bilî wan, ta dûvikên cixaran jî di titqalê de kiriye û bi renekî nazik û lihevhatî di ber hev de daniye, bi rastî wê yekê ciwanî û balkêşiyê berbiçav û giyanewer daye wan tabloyan.

Hunermend Arif di wênekêşiya bi komirê de li ser kerton jî biserketî ye, çend tabloyên wî yê hêja bi komirê hene, behreka hunermend diyar dikin û hestedariya wî ya ciwan bi ronahî û reşantiyê, û serkeftina wî di têkilhevkirina wan di tabloyên xwe xuya dike.

Hunermend di rûyên kesên hinek tabloyan de, li şûna dêv çav kêşandiye, wî ew yek wiha şirov kir û got: Em niha pir dibînin û hindik dendikin, belkî jî ji ber ku tiştê ku gerek e were gotin em nikanin bêjin!. Lê belê digel wê, li vê dawiyê hinek tabloyên ku tijî gewriya xwe de bandikin jî li ba wî tên dîtin!.

Ji bilî tiştên ku me li jor gotine, hozan Şêx Arif helbestê î bi zimanê Erebi dirêse. Gelek di warên têvel de hene, hinek jê giyanek bê tebat li dijî bêdengî û tebatê diyar dikin, û bi aliyê azadiyê û asoyeke fereh de dikşînin.

Li dawiyê, hozan Şêx Arif seredana me bi bîna çend helbestên xwe yê ciwan şêrîn kir.

Mixabin, gelek kesên mîna hunermend li gund û bajarên me hene, keysên xwe bi dest nexistine, û mafê xwe di danasîn û naskirinê ne nebirine, û huner û afrendeyên xwe yê dewlemend ne gihîştine çarçewên hunerî û tevahiya gel. Ew pê hestedar dibin, û em jî bi wan re ne, ku hatine zulmandin. Ew li benda nîr û rewşên baştir in, ku bêtir guhdan bi çand, huner û... bibe.

Ereban, bi alfkariya Fransiyan, navê wê wergerandin Erebi û wisa navê wê bûye QUBÛRILBÎD. Lê belê, di salên 70yê de, û bi pêkanîna pîlanên Erebkirina navan, ricîma Sûriyê navê QUBÛRILBÎD ji belgeyên xwe rakir û li şûna wê AL-QEHTANIYE hate pêkanîn.

Tirbespiyê, çî di dema ku ew gundek bû û çî ku niha ew bajarokek e, cihekî pêwîst di dîrok û erdnîgariya navçeya Cerihê de wergirtibû, her wekû paytexta wê bû. Ew cihekî leşkerî bû ji Fransiyan re, û berî wan jî ji Osmaniyan re. Ji aliyekî din ve jî, ew cihekî girêkok e di nebera Qamişlo û Dêrika Hemko de. Çemê *Cerihê* di Tirbespiyê re derbas dibe û wê dabeşî du perçan dike:

1. Beşê rojhilat: Pirtir ji sêduyên xanî û kesên bajarok tê de dijîn.

2. Beşê rojava: Seranserî rêya Qamişlo-Dêrikê, ji çem û ber bi Rojava de, û li herdu rexên rê, xanî û malên vî beşî ber bi Bakur û Başûr ve diçin.

Li Tirbespiya kevin, ji 250-300 m, başûrî celdê û ta hêla Dirêcîkê ji aliyê Bakur ve, û li herdu rexên çemê Cerihê baxçe û daristanan mil didan hev herwekû dixwestin çem veşêrin; lê mixabin ew dar hemî, çî bi ber û çî bê ber, hatin birîn.

Tirbespiyê lingê xwe di newaleke nîv-deşt de berdaye bi erdê de, û li ser sînorên wê ev gund cî digrin:

- Li bakur gundên Dirêcîk û Şelûmiyê ne.
- Li rojava Dugir e.
- Ji Başûr ve gundên Girdahol û Girşêran in.
- Ji rojhilat ve jî Girê Pirê û Girdêmê Helîmê ne.

Tirbespiyê hêdî hêdî fereh dibû, nexasim di van bist salên dawî de, ta radeya ku ji Başûrê Rojava ve giha ye gundê Girdahol û ji Bakur ve jî giha ye gundê Drêcîkê û pir ber bi gundê Şelûmiyê ve çû ye; wisa jî ji Rojhilat û Rojava ve, ku pirtir ji 100 gavî ji her aliyekî ve, fireh bû ye.

- **Xwediyên Tirbespiyê kî ne?:**

Li gorî kalemêrên kurd gotine, Xelef Axa⁽²⁾ Tirbespiyê dabû Hesênê Ico (yek ji girgirekên êla *Cewdika* bû) û dibin muhra Osmaniyan de qoçan pê hene. Piştî Haco Axa hate binxetê, bi hevpeymaneke di navbera Fransiyan û Tirkan de, Fransiyan ew sirgûnî Tedmurê kirin. Piştî vegera xwe ji Tedmurê di salên bîstan de ji sedsaliya bîstan, Haco hate Tirbespiyê û bû xwediyê wê, lê ne xuya ye bi çi awayî (Tirbespiya Hesênê Ico) bû (Tirbespiya Haco Axa)!

Tê xwestin di vî warî de ku em têbîneke pir balkêş li ser kesên li Tirbespiyê dijîn (hemwelatiyên Tirbespiyê) destnîşan bikin. Ji destpêka avakirina xwe ve, Tirbespiyê cîwarê kurdan bû serku hin kesên xiristiyan jî (Fileh, Ermenî û Aşûrî) bi wan re hebûn. Ji bilî hin Ereben fermanber, karvan û karbidest, yê ku berî salên heftiyan jiyana xwe li vî bajarokî derbas dikirin, ji destpêka salên heftêyan û ber bi jor de Ereben vê navendê jî, hin bi hin, berê xwe didane Tirbespiyê û lê cîwar dibûn.

- **Tax û Beşên Tirbespiyê:**

Tirbespiyê di dema destpêka xwe de du beş bû: Rojava û Rojhilatê çem. Piştî sala 1950an, Tirbepî hêdî hêdî mezin û fereh dibû ta ku niha 6 taxên wê hene:

- Rojavayî çem: taxên Firdews, Cîhad, Al-Sewre û Girdahol.
- Rojhilatî çem: Taxên Qadisiyê û Teşrîn.

- **Cih û warên bi nav û deng:**

Dema em Tirbespiya kevin bi bîra xwe bînin, pir cih û warên bi navûdeng, çi di nav avahiyan de û çi li derdorên Tirbespiyê têne ber çavên me; van cih û waran rengekî taybet dane vî bajarokî. Evên tên jî hin ji van cih û waran in:

1- **Aşê Avê:** Li bakurê malan cî digirt. Hesênê Ico (Xwedê lê bibore) ev aş ava kiribû û ji bo avê bidê eş bîreke avê jî di rex de kola bû. Piştî ku ava bîrê cikiya(miçiqî), ji bo ev aş ji kar nekeve, ava ji çemê Cerihê di

cobarekê re dihate ser. Di bîreweriya me de "Mûşê" ku kesekî xiristiyanî pir bîn fereh bû, û niha çûye ser qedera Xwe, qeraşê êş bû û di karê xwe de jî pir dadmend bû.

2- **Bexçê Mezin:** Li ser drêjaya nêzîkî 130m, û ferehiya 100m, gundiyan ji malbata Haco axa re ev baxçe çandibûn. Ji Başûr û Rojava ve, di ber çem re, darên biyê û spîndar jê re dibûne sênc. Mixabin di van 20 salên dawîn de, dar ne yên bi ber û ne bê ber, tê de neman e; ew niha bûye lîzgeh (yarîgeh) bêyî ku biryara şarevaniya bajêr pê hebe.

3- **Mizgefta Mela Ebas:** Di kêleka êş de û ji rexê Rojhilat ve, bi destûr ji malbata Haco Axa, Kurdên misilman di Tirbespiyê de mizgeftê (Camiyek) ava kiribûn; ev mizgeft bi navê Xwedê jê razî Mela Ebasê Qertmînî bi nav bûbû, çunkî wî rêberî û serweriya wê mizgeftê dikir. Piştî ew çû ber dilovaniya Xwedê, Mela Ehmed cihê wî girt û ta roja îro ew pêşîmam û serwerê vê mizgeftê ye.

4- Di sala 1933 an de Xiristiyanên Tirbespiyê jî **Dêrek** (Kenîstek) ava kirin, lê di van bîst salên dawîn de ew ferehtir kirin.

5- **Qijle:** Leşkergehek e, li Başûr li ser girekî cî digre. Kesekî Xristiyanî qijle kirî û sergirtî kir, û ta îro ew tê de dijîn.

6- **Diyarê Topê:** Diyarkî bi navûdeng e û xwedî roleke pir giring e di dîroka Sûriyê de, nemaze dîroka vê herêmê. Ji roja şerê xwediyên cih bi leşkerên Fransiyan re, vî diyarî cihekî dîrokî wergirtiye; û bi paşê de em dê bi firehî li ser rawestin.

7- **Oda malbata Haco Axa:** Yek ji cihên bi navûdeng bû di Tirbespiyê de; Komîta Şaristanî ya bajêr di şûna wê de kolanek vekirine û bexcek jî danîne, û ta niha ji wî cihê re tê gotin ' **cihê odê** '.

8- **Şiharê Kerikê:** Ev şihar dikeve bakurê gundê Dirêcîkê û di ber cemê Cerihê re ye. Kurdên parêzgeha Heseke tev cihê vî şiharî nas dikin,

çunkî ew ciyê aheng û bîranîna cejna Newozê ye, lê belê ne bi vî navî nas dikin.

Dema merov navê Tirbespiyê tînê ser zimên, du bûyerên bi nav û deng têne ber cavan; yek şerê Diyarê Topê ye, û yê dî jî Lehiya 1962an e.

1- **Şerê Diyarê Topê**: Diyarê Topê bilindcihek e, li Rojhilatî Tirbespiyê li ser riya Dêrikê dikeve. Binavkirin û taybetmendiya vî cihê ji şerekî di navbera hin leşkerên Firansî bi serkêşiya sertîp Rogan û hemwelatîyên Sûriyê, yên li vê herêmê dijîn de hatiye wergirtin. Rogan çend mirov ji gîrgîrekên vê herêmê girtin, hin jî koçber û sirgûn kirin, û hin serokên êl û eşîrên Kurdan jî kuştin, wekû Ebasê Mihimidê Ebês, mezinê êla Dorika. Ev zor û setem bû sedema pêşî ji serhildaneke gelêrî re li dijî wî û leşkerên Firansî yên di bin femandariya wî de di vê herêmê de. Herwiha, dema Rogan ji leşkergeha Endîwerê vedigere Beyandûr, cihê qereqola xwe, êlên Kurd û Ereb li çend deverên wekû Zexîrê, Şebek û Tirbespiyê, êrîş dikirin leşkerên wî. Li ser bilindahiyekê li rojhilatî Tirbespiyê, sertîp leşkerên xwe rawestandî û ferman ku bi topê êrîş berdî kesên ku li hemberî wî rabûne; ewan jî rêya diçe çem li ber girtin. Piştî germbûna lûleya topê nema guleyên wê dûr diçûn, serbazên bi Rogan re jî bêçare man û ji bilî revê tenê di destê wan de nema; serbaz, wekû nokên li kêvir kevin, jev bela wela bûn û revîyan, lê şoreşvanan êrîş berdewam kirin ta ku Rogan hate kuştin; û wekû kalemêrên vê herêmê gotine, di destpêka reva leşkeran de, Ebasê Emoka Rogan kuştibû. Hêjayî gotinê ye, Ebasê Emoka mêrxasekî ji êla Hacî Silêmanî ji gundê Hilwa bû.

2- Lehiya Tirbespiyê: Di 24- 4- 1962 ê de lehiyeke pir mezin li Tirbespiyê rast hat. Di vê rojê de teyrokeke giran û baraneke xurt li Rojava û Bakurî Tirbespiyê barî bû; ji nişkave û di demeke pir kin û teng de xopana vê avê xwe berda nav zikak û **kolanên** vî bajarokî û kete

hindurê mal û xaniyan; bi vî rengî wê pir kes bê mal û xanî hiştin û pir jî kuştin û li ber xwe birin.

• **Gundên bi navûdeng li herêma Tirbespiyê:**

a- **Dugirê:** Gundê Dugirê li rojavayî Tirbespiyê / 5 / km cî digre. Ew gundê malbata Ebês e ji êla dorikan. Dugirê bûbû kelihek ji bo kesên ji Serxetê xwinî û koçber dibûn, nexasim piştî şoreşa Şêx Se'îdê Pîran. Ji kesayetiyên bi navûdeng ku xwe li Dugirê girtine, ev bûn:

1. Haco Axa yê Hevêrkî
2. Emînê Perîxanê yê Remî
3. Hecî Musa Begê yê ji êla Hesenan
4. Kor Hisên Paşa yê ji Êla Heyderan
5. Hemze Begê Muksî
6. Dr. Nafiz Beg
7. Mîr Celadet Bedirxan

b- **Beyandûr:** Dikeve Rojavayî Dugirê de bi / 5 / km, ev gund ê mala Garisê Hecî Silamanî ye. Dema ku Fransî li Sûryê bûn, Beyandûr cihê hêzeke leşkerî bû.

c- **Til-Şe'îrê:** Gundekî pir kevîne di vê herêmê de, li bakurî Beyandûr dikeve. Di sala 1909an de, gundiyan dibîstanek lê avakirin, fêrkirin bi zimanê Tirkî bû, li wê demê Tirkî bi tîpên Erebî dihate nivîsandin, lewma jî hejmara xwendevanan di gund de bilind bû. Hêjayî gotinê ye ku bi dehan xwedî rêzname ji Til-Şe'îrê derketin; pir kesên payebilind ji ev gundê bi navûdeng derketine, wekû: Helbestvan û dîroknivîsê bi navûdeng Cegerxwîn, helbestvanê nemir Mele Ehmedê Namî û Şêx Ibrahîmê Tinatî (Til-Şe'îrî).

d- **Lêlên:** Lêlên dikevê Başûrî Tirbespiyê bi / 9 / km, vî gundî di dîrokê de roleke pir bilind û xuya wergirtiye; ew paytexta Qiralê Aşûrî Şobat Enlîl bû.

Tirbespiyê, digel ku bajarokekî biçûk bû jî, lê pir kesên bi nav û deng û xwedî roleke xuya, demek ji jiyana xwe lê derbas kirine, wekû⁽³⁾:

1- Ibrahîm Nadirî: Yek ji wezîrên komara Mihabadê bû. Ew di sala 1947an de li Tirbespiyê demekê maye.

2- Helbestvanê bi navûdeng Hejarê Mukriyanî di navbera 1956–1958an li Tirbespiyê dijî.

3- Isa Zebîhî: Yek ji kesên ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê damezirandin.

4- Helbestvan gewre Mele Ehmedê Namî.

5- Cegerxwîn: Ev helbestvanê mezin xwediyê / 8 / dîwanan û hin pirtûkên din (çîrok, rêziman, dîrok).

6- Apê Osman Sebrî xwediyê (Elfebaya Kurdî), û sekretêrê partiya Çep ya Kurd li Sûriyê.

7- Zimanzanê Kurd Reşîdê Kurd

1. Ji qoçanekê hatiye wergirtin

2. Xelef Axa: Yek ji axayên Kurda bû di dawiya serdema Osmanîyan de; ew li gundê Eznawirê dijî. Ew di herêma Sincêqê de pêşkarê Osmanîyan bû, û bi navê wî (deşta Xelef Axa) dihate naskirin. Sincêqa Xelef Axa (Beriya Xelef Axa) ji deşta Mêrdînê dikişand ta bigihê deşta Hesinan, û ji çiyayê Bagokê ta sînorên Şingalê. Piraya gundên vê navçê di wê demê de ji dana Xelef Axa ne.

3. Zagrosê Haco, Tirbespî (gotarek ji internetê).

HEJAR (1902)¹

Pertewê Şerqî

Navê wî Ewdulrehmanê Şerefqendî ye, di sala 1920 de li bajarê Mehabadê ji dayîkê bûye. Bi gotin û gilîkirina Hejar, malbavê wî ne dewlemend bûye, lê bavê wî mele bûye , di biçûktîya xwe de li cem bavê xwe hînî xwendinê bûye .

Jîyîna Hejar, nivisandin û helbestên wî bi jîyîn û halê netweyê kurdan ve girêdayî ne. Li nav salên 1941-1947 de eskerê sovêtîstanê ketibû welatên bakurê Îranê. Hingê piranîya Kurdistanê li bin hukmê eskerê Sovêtê de bû. Hingê tîrêjên roja azadîyê dabû ser welatê kurdan, zordarî û zulma şahê Îranê li ser gund û bajarên kurdan hatibû hildan, biçûk û mezin hişyar bûbûn, merivên xwendewer, hozan û şoreşgerên kurd kom û komelêyên azadî û serxwebûna kurd û Kurdistanê saz kiribûn. Li Mehabadê komara kurdan ya serxwebûn hatibû saz kirin. Hema di wî werî de bîr û bawariya kurdewerî û wetenperwerî di serê Ebdurehman Şerefqendîda rûdine, ew dest bi nivisandina helbestên kurdewerî û niştimanperweriyê dike. Wî demê ne dayka wî, ne bavê wî mabûn, ew çûbûne rehmetê, kesekî wî, ne bira, ne jî pismamê wî hebûn, ew di halekî belengaz û hejar de dijîya.

Ev in du perçeyên bijarte ji helbestên wî:

¹ - Jêder: Qanatê Kurdo- pirtûka "Tarîxa Edebiyeta Kurdî".

HER KURD IM

Kurd im û li riya kurd û Kurdistan
Ser û pê didim ser destan,
Bi kurdî dijîm, bi kurdî dimirim,
Bi kurdî didim bersiva qebra min,
Bi kurdî dîsan zêndî dibim,
Li vê dinê bi kurdî her diçim.

TU JI KÊDERÊ YÎ

Ji Ezîz, Bitlîs û Merdînê,
Zaza û Mekis û Kilîs û Efrînê,
Dersim, Erzerum, Erzencanê,
Bazîd û sêêrdê û wanê,
Malatîya, Dorinde û Bostan,
Diyarbekir û Cizîra Botan,
Baş-qela û Xozat û Palû,
Muş û Culamerik û Maku,
Genc û Keyf û Sarîqamîş,
Sîverek û Eyntab û Merîş,
Amûdê û Derbasî û Jengar,
Ta Qamişlî û ereb pinar.

Stranbêjê Çiyayê Kurmênc Omerê Cemlo ((1922-1981))

Amadekirin:
Arif Tislorî

Di seredanekê de ji pîreka stranbêjê Çiyayê Kurmênc Omerê Cemlo re, ku hîn li darê dinyayê ye, û bi mêvandariya kurê wî Zeredeşt, û li ser daxwaza me, ew wiha li ser jiyana hunermend û stranbêj bi navûdeng Omerê Cemlo axivîn:



Omer kurê Cemîl kurê Hemo ye, ew li sala 1922an li gundê Xezîwê di maleke Kurd û Êzdî de ji dayîk bûye, û ta dawiya temenê xwe li ser ola bav kalên xwe maye, û di sala 1976an çûye seredana Lalişa Nûranî li Kuedistanê û heca xwe jî kiriye.

Omer jî di dirêjiya jiyana xwe de, wek gundiyekekî ji gundiyeên deşta Cûmê cotarvanî

û li demekê şivantî jî kiriye, wî ta dawiya jiyana xwe gundê xwe berneda û di goristana wî de jî hat veşartin.

Omer di zaroktî û xortaniya xwe de stran ji apê xwe "Kalo" hilanîn. Kalo

Stranbêj Omerê Cemlo stranbêjekî dengxweş bû, carina bi dilşewatî digot: Ezê bimrim û stranên min jî dê bi min re bimirin, lê wî nizanî ku biraziyê wî Omer hemî stranên wî bi deng û awaz li ezber dikiran.

Ji bilî wî, Omer ji dayîka xwe "Kil" jî gelek stran dibirin, diya wî jî jineke pir dengxweş bû, lorîna wê hêstir bi çavan dixistin, belkî di bin bandora şêrîniya dengê diya xwe de

Omer jî bi ser hunera stranê de çûye û gotin û awazên gelek stranan li ezber dikir.

Omer xudî dengekekî zelal û germ bû, gava mirov guhdarî strana wî yên bi şewat dikir, rondik bi çavên mirov diket, belkî jî ji ber ku bi şeweyekî pir lihevhatî, bûyerên strana bi hev ve girêdida û distira.

Omerê Cemlo xudî dengekî nerim û bi hêz bû, loma jî kanî bi katan bi ser hev de bistra û ne diwestî.

Stranbêj Omerê Cemlo jî, mîna stranbêjên dema xwe, bi pîranî stranên civaka Kurdî digotin, mîna stranên: "Eyşa Îbê

- Eliyê Mêmed- Êma Hemo- bêmal- Hemê Haco- Sînem". Di salê şêstî de, û piştî şoreşa Êlûnê li Kurdistana Îraqê, wî jî mîna gelek stranbêjên Çiyayê Kurmênc, stranê netewî jî pir xweş digotin, nemaze wî strana "Şêx Se'îd- Welato" pir bi xweşik distira.

Bi rastî, û digel hemî tiştî, stranbêjê hêja Omerê Cemlo jî mîna stranbêjên dema xwe, kanî stran û peyvên Kurdî bi parastana û ciwaniyek jî daxista ser gelek awaz û stranan.

Erê Omerê Cemlo mir û çû diyarê heq, lê dengê wî hîn di guhê mirovê Kurd de zindî ye.

Rêzman

Têbîn di mijara rênivîsa Kurdî de

Rozad Elî

Hatiya nasîn, ku daçek û cinavên kesîn ên kesê sêyem (yekejimar û gelejimar) di zimanê Kurmancî de dibin yek û cinaveke bi navê "cinava lihevxiştî" çê dikin. Kanî em bala xwe bidin daçek, paşdaçekan û cinavên lihevxiştî di hevokên jêrîn de:

a. Daçek "**bi**" û paşdaçek "**re yan ve**":

1. Tişt **bi** makîne **re/ve** şand.. Çê dibe em bêjin jî: Tişt **bi** wê **re** şand.. Û wiha jî dibe: Tişt **pê re/ve** şand..
2. Tişt **bi** makîne şand.. Çê dibe em bêjin jî: Tişt **bi** wê şand.. Û wiha jî dibe: Tişt **pê** şand..

Di hevoka yekê de paşdaçek "**re û ve**" bi daçeka rasteqîn "**bi**" re hatine.

Di hevoka duyem de daçek rasteqîn "**bi**" bê paşdaçek hatiye.

b. Daçek "**ji**" û paşdaçek "**re**":

1. Derman **ji** nexêş **re** bir.. Çê dibe em bêjin jî: Derman **ji** wî **re** bir.. Û wiha jî dibe: Derman **jê re** bir..
2. Derman **ji** nexêş bir.. Çê dibe em bêjin jî: **Ji** wî bir.. Û wiha jî dibe: Derman **jê** bir..

Di hevoka yekê de bi daçeka rasteqîn "**bi**" re paşdaçek "**re**" hatiye. Di hevoka duyem de daçeka rasteqîn "**ji**" bê paşdaçek hatiye.

c. Daçek "**di**" û paşdaçek "**de**":

1. Zerik **di** avê **de** kir.. Çê dibe em bêjin jî: Zerik **di** wê **de** kir.. Û wiha jî dibe: Zerik **tê** de kir..

2. Zerik **di** avê werkir.. Çê dibe em bêjin jî: Zerik **di** wê werkir..
Û wiha jî dibe: Zerik **tê** werkir..

Di hevoka yekê de bi daçeka rasteqîn "di" re paşdaçek "de" hatiye.
Di hevoka duyem de daçeka rasteqîn "di" bê paşdecek hatiye.

d. Daçek "li":

1. Av **li** gulê kir.. Çê dibe em bêjin: Av **li** wê kir.. Û wiha jî dibe:
Av **lê** kir.

Di vê hevokê de, daçeka rasteqîn "li" bê paşdecek hatiye, ji ber ku bi tevahî, ew paşdaçekan nastîne.

Di van herçar rewşan de, û li gora rêzikên rêzmanana Kurdî, daçek bi cinavên kesîn ên kesê sêyem ên tewandî (wê , wî) re dibin yek û cinavine nû çê dikin, û ji wan re cinavên **lihevxiştî** tê gotin, ew cinav jî ev in:

Bi + (wî , wê) = Pê , Vê. Li + (wê , wî) = Lê.
Ji + (wî , wê) = Jê. Di + (wî , wê) = Tê.

Ew cinav jî, cinavine serbixwe ne, xudî pergalen taybet in, û di nivîsandinê de bi serê xwe tên nivîsandin.

Em bawer in, ta vir her tişt naskirî ye, û ti mij li ser mijarê tineye.
Lê kanî pirs têbîn di kû de ye?

Pirs û têbîn ev e: Hinek nivîskarên Kurdî paşdaçekê jî bi cinava lihevxiştî dixin, û herduyan mîna bêjeyekê bi hev ve dinivîsin.

Wek:

Tişt pê re/ve şand.. wiha dinivîsin: Tişt **pêre/pêve** şand..

Zerik tê de kir.. wiha dinivîsin: Zerik **têde** kir..

Derman jê re bir.. wiha dikin: Derman **jêre** bir..

Gelo! Ev şêwenivîs ji hêla rêzmanê de rast e, lê na?

Bi dîtina me, û ji ber gelek sedeman bersiv dê na be!

1. Hatiye zanîn, ku cinavên lihevxiştî hevdudanî û serbixwe ne, ew tenê ji du hêmanan pêk tên, *daçek* û *cinav*. Lê belê, nehatiye dîtin û zanîn jî, ku ticarî ew herdu hêman bi paşdeçekan re bûne yek û têkelhev bûne. Herdem paşdaçek bi serê xwe li paş peyv an hevoka ku li paş daçekê ye, tê. Jixwe, daçekin jî hene hîç pêdviya xwe bi paşdaçekan nînin, mîna daçeka "li" di hevoka (d) de li jor. Û hin din jî hene, kanin bê paşdaçek karê xwe di zelalkirina hevokan de bibînin, wek nimûneyên jorîn (a2,b2,c2).
2. Eger ev rawe (jêre, têre, pêre/ vêre) salt werin dîtin, û were xastin ku em wan bi lêv bikin û wateyên wan jî bidin zanîn, bêguman emê di ber de bimînin û rêya rast winda bikin, ji ber ku ew rawe bi ew pergâlên xwe yê duqolî hîç bê wate ne, û mirov di lêvkirin û watedayîna wan de jî dê şaş dibe.
3. Nêrîna rêzmanî ya ku bi ferehî hatiye pejrandin dibêje, rastir û baştir e, ku her bêjeyeke serbixwe bi tena serê xwe were nivîsandin û kesayetiya xwe ya rêzmanî biparêze. jixwe cinav û paşdeçek jî du bêjeyên tam serbixwe ne, û loma jî rastir û durustir e ku negihên hev û her yek jê serbixwe werin nivîsandin.

Kurte çîrok

Çûkek û Azada Şêrîn

Narîn Omer

Beriya demekê ez li bin siha darekê rûniştî bûm, min xwestek û xweziyên xwe bi çeng û bang dikirin. Min amadebûna pêkanîna niyazên pêşerojê dikir.

Di germbûna goftûgoyên dilê min bi giyanê min re, ez li pispisa goftûgoyên dî veciniqîm, û bi matbûnê re tewş u mewş bûm, ji ber ku ew pispis ne ji gumana mirovan di firî, belê ew ji hêlîna çûkan hildikşiya.

Çûka mak şîretên xwe li çêlîka xwe kom dikirin da ew ji hêlînê nereve û derketina xwe beloq neke. çêlîka wê ew şîret bi bayê serhişkiyê re difirandin.

Çîlîk dibêje:

-Ezê bi serbest bifirim û awazên çîwçîwa xwe li asoyan belav bikim.

Mak dibêje:

-Çêlazoka min! Ma tu dixwazî peryên baskên te bi bayê mij û dûmanê re bêne birîn û bê reng bibin?

Çêlîk ji dayê re erê dike ku ew ji biryara xwe nayête xwarê , ji ber ku dem îro dema wê ye.

Beriya ji hêlînê derkeve li maka xwe dizîvire û dibêje:

-Dibe ez li te venegerim, bi xatrê te, li min bibore. Paşt re herdu çengan vedide û bi çîwçîwê re distirîne û dibêje:

((Azada şêrîn, her kes dinêrîn, de were virde azada şêrîn)).

Ew van gotina dibêje û ji nişkave dengê çîwçîweke dî dike, li paş xwe dinêre çend çûkan dibîne ku ew jî li ser şopa wê difirin, bi hev re sitranê dubare dikin.

Piştî demeke kin dengê sitranê zelaltir dibe û asîmanên berfireh bi deng û awaz dike.

Maka dilovan li pey çêlîka xwe diçe, dema nêzîk wê dibe û dibîne ew serkêşiya refên çûk û tillorên jor û jêr dike, asîman li dora wê dizîvire.

Bero wan diçe û bi wan re qîr dike:

((Nazik delalê, nûra şemalê, rehnê li balê , tarî dimalê....de were virde azada şêrîn)). narinomer76@gmail.com

Kurteçîrok



Bavê vînyar

Gelo ew çî konin li sînorê gundê me xuyan dikin? Ew kon ên kê ne? Ew kengê hatine? Êêêêêê.. ew kî ne???. Ma gelo ew rêwî ne, an ewê hertim li wir bin?? Ez hêvî dikim, ew rêwî bin, rojekê dududiyên bimînin, û ji wir herin.

Cemalo ji bavê Behzêd pirs kir, çî heye tu bi xwe re dipeyvî ? Çî hey tu bi rojhilata gunde ve dinihêrî, û pitpita te ye.. çî heye ??

Bavê Behzêd kesereke kûr kêşand û bi nêrîneke tengijî li Cemaloyê lihevketî mêze kir, û ji neçarî ji wî pirs kir, ma ewên han kî ne? Ew çî kes in? Cemaloyê bejin qujmirî got hahûûû.. hahûûû , ew mîvan in, ewê li gundê me rûnin. Bavê Behzêd zêdetir tengijî, ew di Cemalo de pijiqî û got: Tu çî dibjî ? Çawa ewê li gundê me rûnin??! Cemaloyê bê qiret got: Ew biyan bûn, lê niha ne biyan in!! Çawa ew ne biyan in? Ma qey tu dîn bûyî.. çawa ne biyanî ne!!.

Cemalo got: Wan li sala borî hinek erdê gundê me ji xwe re kirîne, ew îro di konan de rûniştine, lê piştî çend mehên din, ewê ji xwe re xaniyan bigrin û tê de rûnin, û bi wî şeweyî gundê me dê mezin bibe. Bavê Behzêd cilfirî bû, hema te digot belkî Cemalo sîlek li wî da, wî gopal di Cemalo de hejand û got: Eger ev gotina te rast be, xêra gundê me nema, nema em kanin xwediyê zevî û baxên xwe bin.

Li dema êvarî Cemalo û çend kesên wek wî, hatin mal bavê Behzêd, dema çavên wî li Cemalo ketin, tirş û talî di mirûzên wî de

herikîn... Bavê Behzêd ji wan pirs kir, çi heye? Xwedê xêra we bide, dîsa çi di tûrkê we yê reş de heye?? Bêjin çi heye?

Cemalo devê xwe miçmiçand, û gurzê kilîtan di nav tiliyên xwe de hejand, û got: Em ji bo zeviyê te yê zêtûnan hatine cem te. Çi heye zeviyê min çi bûye? Hahûûû.. hahû ma qey te hajê tuneye, ku Xwediyên konan ew herêm tev kirîne, û zeviyê te bi tene ketiye navîna wan zeviyên, wê lomê jî ewan dixwazin zeviyê te jî bikirin.

Bi wê gotinê re, te digot belkî kevir û koçikên Çiyayê Lêlûn tev bi ser bavê Behzêd de hatin xarê, xwasteka Cemalo weke birûskan bû, lê birûska tariyê bû, pêş çavên Bavê Behzêd reş û tarî kir. Ji nişkave wî dest avête gopale xwe û vewşande milê Cemalo yê cambaz, û di wî de kire qêrîn û got: Wek ez zanim malbata we pir bi rûmet e.. malbateke welatparêz û netewperest e, lê ez nizanim tu li kê hatiyî, rabe ji mala min derkeve, tu mirovekî qirêj î. Bila tu û ev kesên bi te re zanibin, ku ev gopale min, ji şaxên darên zeviyê min e, û ezê gora xwe jî di axa zeviyê xwe yê zêtûnan de bikolim.. Ey gemar, yê ku erdê gundê xwe bifroşe biyaniyan, rûmeta xwe erzan dike.

Bavê Behzêd li ser hemû mervên xwe geriya, pere kom kirin, dewar û pezê xwe jî firotin, û makîna kurê xwe Behzad jî firot, belê wî zêrên pîrejina xwe jî firotin, piştî heftekê ew û çend rêberên gund çûn cem xwediyê konan, wan hemû erdê gund vegerandin, piştî kirîne ew tev çûn mala Cemaloyê cambaz, û ji wî re gotin: Eger em careke din bibhîsin, ku tu ev karê pîs û qirêj dikî, emê te ji gund biqewtînin. Gundê me beşek e ji welatê me, yê ku axa gundê xwe bifroşe, ew welatê xwe difroşe.

02 . 02 . 2012z.

Toxtir Axa

Dr. Ebdilmecît Şêxo

Di kela havînê de, min û keça xwe Rengînê di nav zeviya keyayê gundê me de çelem hildikirin, tîrêjên rojê serên me hemuyan nîvkelyayî kiribûn, pilepila serkarê me jî bi gotinên zû.., zû û hindik ma ye roj here ava , em şêt û mêt kiribûn, lê divê ez ji bîr nekim jî ku malxuyê min, bavê Rengînê mîna pir caran çû bû ber çemê Efrînê nêçîriyê masiyan, haya xwe ne ji vê dinê û ne ji wê dinê hebû.

Ji nişkava Rengîna min bi qêrîneke bilind gazî min kir ; dayêê zikê min, dayê zikê min, gêj bû û ewê xwe bi ser min de gêr kir .

Bi lez min telîfon toxtirekî kir, digotin; ew bijîşkek baş e, mirovperwer û azadîxwaz e.. Elooo.. Ez diya Rengînê me, keça min di nav zeviya çeleman de bê hiş ma ye, ew ne dilive û ne dişive, ji kerema xwe tu kanî werî cem me ? Te got çî! Weleh xelk şerm nake !Ma ez toxtir im ,lê azepê we me!!! çerq telîfon girt.. Ji vir û ji wir dayikê misînek av li ser ruyê Rengînê de vala kir. Ewê bi alîkariya sê, çar jinan, Rengîna xwe li paşiya pîkaba serkarê xwe kir û ew gihan pêş toxtirxana bijîkê navdar li Efrînê.

Dîsan dema te baş be Toxtir Efendî , va ye em li pêş derya te ne , tu dikanî derziyekê di pîkabê de li Rengînê xînî, ewa hîn bê hiş û bê hêz e,

Weleh xelkê me tènaghîne ! Lê min bi te re ne got ez ne azepê tu kesî me, here kuda derî, here! Te fehim kir jinikê! Toxtir mîna min li Amêrîka tune ne .

Dîsan diya Rengînê bi alîkariya çend xêrxwazan Rengîn mîna laşakî birin cem Toxtir Axa , Axe Toxtir di bin berçavkê xwe re nihrî,

û gote me; Ez zanim hûnê werin cem min , ma kîjan Toxtira li Efrînê kane mîna min wê çêke !

Lê hûn rûnin.., rûnin ez dengkirina xwe bi jina xwe re kuta bikim... Erê, erê jinek hema bila firavîna me dankek û zerkek dewê çêlan be, bes e, bes e, te mala min bi wan şîvên buha xera kir , dîsan çîrç telîfon bi ser rûyê jinka xwe de jî girt û bi rûyekî dernexûn; Te digot qey şîşek tîrşa qoriq bi ser rûyê wî de rijiya bû, gote me; Ka wê laşê hûnin ser têxt!

Ev derziyek , çerp sîlak li aliyê rastê û çerp sîlak li aliyê çepê , hêdî, hêdî Rengînê çavên xwe vekir, Toxtir Axa yekser gote nexwaşa xwe; Tu çi bû yî, tu ewqas dirêj î, tu çi dixwî?? Here vê carê li çolê baş biçêre! Ne!

Rengîn li diya xwe matmayî dinêhre û di berxwe de dibêje; Dayê te ez anîme cem Toxtirê dewêr??!!!

Diya Rengînê li çavên Toxtir Efendî temaşe dike, ne zane ewa dîn e, ne zane ewa serxoş e, ewa jî di berxwe de dibêje; Min nizanî bû , ez mîh im û min berxika xwe aniye cem Toxtirê dewêr..!!!

- Min bi serê berxika xwe girt! Em bi rûyekî zirêçî, dest û lingên sar ji cem Toxtir Paşa derketin û min bi Rengîna xwe re digot; Erê keça min, ji berê de bapîrên me gotine; (Nav giran e lê mezê wêran e).

Efrîn
Tabax 2011

Keça Hişmend

Dibêjin, xortek berzewac bû bû, û doza zewaciyê li bavê xwe dikir. Lê bavê wî didît, ku hîn lawê wî biçûk e û ne bûye mêrekî dagirtî. Wî li ba xwe got: Ezê ezmûnekê pê bikim, eger ew tê de bi serket, ewê mêtantiya xwe bi terixîne û ezê wî bizewcînim, lê eger bi serneket, ezê zewaciya wî demeke din bihêlim.

Bavê ji kurê xwe re got:

- Kurê min, çêroka zewaciya te pir hêsan e, beranê me di kozê de ye, siba rabe bên di serê wî ke û bibe bazarê bifroşe; Lê belê tuyê van mercan bi cî wînî.
- Ew merc çî ne, kurik got?
- Tuyê berên bibî bazarê, bifroşî û di pênc katan de jî, kîlok goştê wî wînî, û berên bi xwe jî bi xweşî li mal vegeînî.

Bê ku, kûrik di mercan birame, ji kêfa re erê kir. Û wê şevê ji şabûna re xewê bi çavan neket.

Danhev: Mihemed Q. Hesên

Kurik bi hilhatina royê re, ji nav nivînan rabû, çû kozikê, beran bir û kete rêya bazarê. Di rê de pêrgî kalekî hat. Silav lê kir û bi kêlekê ket. Li ser rê, çavê wan li zewiyekî ket, genimê wê serdî bû, serî xwar bûbûn û li ber palê bû. Xort ji kalê pirsî:

- Apo, xudiyê vî genimî jê xwariye lê wê hîn jê buxwe ?

Kal di hundirê xwe de perçifî. Lê deng bi xwe nexist. Bi xwe re got: Ev çî mesmût e, pirsên weha ji min dike!

Xort demekê li benda bersivê ma, lê tu gotin bi ber guhên wî neketin.

Demeke dî bi rê de çûn, û rastî mezelekî hatin, kesina bi ser mirîkî de nimêj dikirin; wan jî fatîhe li boyî canê mirî xwend û rêya xwe ajotin .

Kurik dîsa ji kalê pirsî:

- Apo, ma ev mirî berê mirî bû, lê niha miriye ?

Kal dîsa ji pirsê wî mat bû, û di xwe de lal ma. Lê vê carê

bersiv bi kişandina bihnek kûr
û awirekê da.

Piştî meşeke dirêj, tebatî
neket kurik, wî pîrsek din ji
kalê kir û got:

- Apo, niha tuyê min hilgirî?
Lê ezê te hilgirim?

Vê carê mîna derîkî ku her
du tekên xwe li ser piştê vebin,
kalê got:

- Ji destpêka rê de, te ez bi
van pîrsan gêj kîrim! Tu çi ji
min dixwazî? Tu diçî bazarê
daku beranê xwe bifroşî, ma
karê te bi van pîrsan çi ye!.

Dema ku gihîştin bazarê ji
hev veqetin û heryek bi aliyekî
de çû.

Kal çû mal, li nava hewşê
rawestî û deng li keça xwe ya
bermêr kir:

- Keça min.. Zerikê tijî av
bike, ez ji tîna re fetisîme!

Dema keçikê dengê bavê xwe
bihîst, bi lez zerka avê jê re
anî. Piştî kalê av vexwar,
keçikê pîrsî:

- Bavo Xwedê xêra te bide.
Çi bi ser te hatiye, ku ewqas
tu westayî ?

Keça min ezê çi serê te
bêşînim.

Keç: Divê tu ji min re
hewaldî, daku dilê min vehese !

Keça min çi ji te re bêjim! Bi
rê de mesmûtek pêrgî min hast,
her çend gavan pîrsek ji min
dikir, û min nikanî bersivên
wan bida, ez gêj kîrim, bêhin ji
min birî,

Keç: Ka wan pîrsan ji min re
bêje.

Kal: keça min serê xwe bi
wan pîrsên vala mêşîne.

Keç ji bavê negeriya heya
pîrs jê weşandin. Ew di wateya
pîrsan de diramî, ji hev dikirin
û bi hev dixistin, lê li dawiyê ji
keçê re bû meroq ku wî
(mesmûtî) bibîne; ji ber ku ev
pîrsên han ji mesmûtan
dernakevin, xwediyê wan ne
kesekî rijî û xav e.

Keçikê çû zerkek mastî
neşkandî û danzdeh nanên
genimî kirin baxçekê, da bavê
xwe û jê re got: Tuyê herî
bazarê ba ew mesmûtê ku bi rê
ve bi te re hat; bila bersiva vê
baxçê bide û bi xwe re jî wîne
mal.

Bavê baxçê bi dest xwe kir, û
çû bazarê, bi rê de nanek bi
mêst xwar û baxçê jî wek berê

girêda. Ewçû nav bazarê li xort gerî, dît, bir hêlekê û çêrokê jê re hewaldide, xort bersivê weha da kalê:

- Sala we yazdeh mihe ne! Hêva we perçe ye !

Kal digel mêvanê xwe li mal vegeirî, keça kalê bi erka mêvanê xwe rabû, û jê re got:

- Te bi rê ve hinek pirs ji bavê min kiri bûn, ezê bersivên wan bidim.

A yekê, gava te genimê seridiye dît, te xwast bêjî, xwediyê wî genimî pere li ser biribin lê na?.

A diduyê, eger ew mirovê ku dikirin tirbê xwedî sinciyeke baş bû, jiyana xwe di rindiyê de derbas kiribû û zarokên xwe jî baş perwerde kiribin, hîngê ew mirov dê nemirî be û navek li şûn xwe hêşti be. Lê gav ne weha be, ew ji zû de miriye.

A sisyê: Mirov hevaltiyê bi rê de dike, çinkî rê bi denkirinê bi dawî dibe, lê mirov li kolên hev nanin.

Keçê û xort gelek bi pirsên tekirmeyî avêtin hev. Li dawiyê keç li doza wî pirsî? Wê hîngê

xort çêroka xwe jê re hewaldide.

Keç: Mercên bavê te pir hêsan in, gava bavê te, beran daye te û ev merc danîne, xwestiye te bi ber ezmûna jînê de. Tu yê herî berên bixesîne û gunên wî rakî; Ev e kiloyê goşt. Berên biquşîne û hiriya wî bifroşe; ev jî pênc kaxetan dike. Û herwiha tuyê bi serê beranê xwe bigrî û bi ganî li bavê xwe vegeirî.

Xort weha kir û li mal vegeirî. Bav di rewşa kurê xwe de ramî, wî dît ku ev kiryar di ser kanîna wî re ye, got:

- Kurê were hewalde; kê ev merc ji te re çareser kirin.

Kur tiştê ku vê re bûye ji bavê re hewaldide. Bavê ew çare li pêwir û pîvanên xwe xistin, û bawer kir ku ew keçeke pir hişmend e, û xwast here ji lawê xwe re bixwaze. Bi lawê xwe re got: Tu dil dikî ku wê keçê ji te re bixwazin. Kurik got erê.

Herdu bi hev ketin, çûn mala bavê keçikê û doza xwastina keça wî jê dikirin. Piştî dan û

standinê, kal û keçê jî dil kirin,
û bûka xwe anîn mal.

Piştî ku xoce nikeha wan
derxist, kurik destûra çûna ba
bûka ji bavê xwe xwast. Wê
hîngê bavê destûr dayê û lê ev
daxwazek jî jê kir û got:

- Xwedê karê we bi xêr
biqedîne; lê belê ez siba li
taştiya lawekî çardeh salî ji te
dixwezim, bila misîn di destekî
de be û desmal jî di yê din de
be, û avê li destên min bike.
Law mat bû, bê deng bi der
diket, çû periya bûkê li kêlekê
danişt û serê xwe kir nav herdu
destan û ponijî. Bûkê jê pirs
kir: Çi bûye? Çi bi serê hatiye?
Çima tu wek sêwiyan melûl
bûyî.

- Çi bêjim?! Bavê min
daxwazek ji min kir.

- Çi daxwaz e ?

Zêve daxwaz jê re hewalda.

Bûk baş e, ew weha dixwaze?!
Tuyê herî hespekî zînkirî û
kurbacekê ji min re wîni, ezê
daxwaza wî bi ci wînim.

Zave: Çawa?

Bûk: Ew ne karê teye.

Zêve daxwaza bûkê bi cih anî,
wê jî kincên mêran li xwe kirin
û rûyê xwe pêça, li hêsp siwar
bû, di ber deriyê apê xwe re du
sê daran bezand, apê derî vekir
lê nihêrî; lê ew nas nekir.

Ap: Kî ye ?! Kî ye ?! Di va
şevê de çi dixwazî.

Sîwêr bi dengêkî mîna
birûskê jê re weha got:

- Tu rabe xaka xwe bi cehê
biçîne, siba bi taştiya re cehê
bike qesîl, ku hespê xwe lê
biçêrînim. Ger te weha kir tuyê
rizgar bibî; lê eger te weha ne
kir serê te wê bifire.

Apo: Sîwaro! Bergeh weha
tuneye, çawa cehe dê îşev were
çandin û siba bi taştiya re jî bib
qesîl? Tu tiştêkî ku netê kirin ji
min dixwazî ! Ez nikanim.

Sîwar: Baş e!. Lê çawa tu bi
taştiya re kurekî çardeh salî ji
lawê xwe dixwazî.

Bi wê peyvkirinê re apê bûka
xwe naskir û dev ji daxwazên
xwe berda. Dest li piştê xest û
enî maç kir û jê re got: Here
keça min, keça mêran, xwedê
tev te û mala te be, û herwiha
şahiyê di dilan de zîl dida .


PÊDARÎ

Merwan Berekat

Ey nijadperestino..
hûn çi dikin.. bikin,
lê..
hûn nikanin
di rehên me de
xwînê sar bikin
û ne jî kanin..
vedengên dengên me bibirin
naaaaaa.... na..
hûn nikanin.

Hûn çi dikin... bikin,
lê hûn nikanin
li pêş pêlên nêhrînên me
bendan ava bikin
hûn nikanin...
zinarên welatê me bê can bikin
hûn nikanin..
kaniyên pêdariya me ziwa bikin
naaaaaa.. na..
hûn nikanin.

Ey nijadperestino..
hûn çi dikin... bikin,
lê..
hûn nikain
wêneyên avdarê
ji çavên me bidizin
hûn nikanin
di rehên çiyayên me de



şoreşê bê deng bikin
naaaaaaaaa.. na..

hûn nikanin.

Hûn çî dîkin... bikin
lê.. hûn nikanin
bi lêdan û zîndan
stêrkan binçav bikin
û zimanên birînên me lal bikin
hûn nikanin..
têlên tempûrên me biqetînin
û berên wesêkên papîrên me..
ji mejiyên me birevînin
naaaaa... na..

hûn nikanin.

Ey nijadperestino..
hûn çî dîkin.. bikin,
lê.. hûn nikanin..
dîlovaniya..


Metîn û Rost bimiçiqîn
hûn nikanin..
pêdariya..

Zagros û Dirsimê xûz bikin.

Hûn nikanin...
rehên Ferêt û Efrînê
ji xaka rewanê me hilqetînin..
hûn nikanin..

navên... Şîlan, Zekiye Alkan
Gîvara û Celal Kemal
ji ferhengên rûmetiya Kurdan rakin
naaaaaaaaa.... na..

hûn nikanin.



Ey nijadperestino..
hûn çî dîkin.. bikin
lê.. hûn nikanin..
wêneyên pakrewanên **AZADIYÊ**
ji asoyê welatê me raqkin
hûn nikanin..
hêrsên xwîşka Çîçekê
ji pêdariya dilên me biqetînin
hûn nikanin..
navên.. Hisinê kirîf, Arî û Ferîdê
ji helbest û sirûdên...

AZADIYÊ rakin

naaaaaaaaa... na.

hûn nikanin.

Ey nijadperetino..
hûn bi tariya mejiyên xwe
nikanin pertewên roja me ...
qedexe bikin

naaaaaa..... na..

hûn nikanin.

22 . 10 . 2011z .

Dayîkbûna Evînê

Pertewê Şerqî

Bi bahozên bêdeng re
Bi kenê Bihareke dilgerm re
Bi kenê lêvên şermok re
Di roja dayîkbûna min de
Bi evîna te rojên min xemilîn
Ez û evîna te..
Di yek rojê de ji dayîk bûn.
Evîndara min..
Evîna te bê destûr
Sînorên dilê min talan kirin
Şahiyên bê soz
Di tamarên min de berdan
Li ser singê te
Hemû hestên min serxoş lîstin
Ta evîna te canê min avda
bayê bêzariyê
Û bawêşînên teze
Di himbêza te de lolijandim
Wê lomê jî..
Ez kal nabim
Û her tim ezê helbestên evîndariyê birêsim
Ta tu hebî
Ezê hebim
Û ta lêdanên dil hebin
Ezê di jiyana çavên te de bijîm
Ta ez hebim..
Ezê ji rojên te re pertewê evînê bimînim.

Dayîkbûna Evînê

Dayê

Bêrivan

Dayê..
Çawa roj hiltê
Çawa dem dibore
Çawa gul geş dibin
Çawa bîn xwe di nêrgizan de vedişêre
Bi min re bêje...
Çawa ezê evînê binasim.
Dayê....
Min hîn bike
Çawa Bihar tê û bilbil fixan dikin
Bi min re bêje..
Kengê ezê şahiyê ramûsim
Û gelawêjê li berbangê mehir bikim
Dayê...
Bi min re bêje
Çend navên evînê hene?..



Serpêhatiyek

Amdekar:

Dr.Mihemed Elî

- Navê te çî ye?

- Navê min? Nûr e.

- Tu çend slî yî ?

- Ez nizam çend salî me! Lê ez wexta herbê bûme.

Kîjan herbê?

- Wele ez nizanim. Lê diya min digot bavê te careka tenê li ba min xwe kir, û çû herbê û venegerî, eger tu wê herbê zani bî tuyê temenê min nas bikî!!

Ez û jina ku vê re hati bû, kenyan. Min texmîn kir, ku ew çêre şerê cîhanê yê yekê dike, wî şerî jî li ba me li sala 1916an dest pê kir.

Jina ku vê re bû, got: “keko ev pîra ne hindik e, ew bi mêrê xwe re reviyaye”.

Wê hîngê ew kenî û wiha got:

- Tu çiqas fedi nakî, li min jî nihêrî û got: Kurê min, bi xwedê ez bi xwe ne çûm. Milkê bavê min pir bû, xûşk û birayên min jî tune bûn, loma jî ji bo ku apê min milkê me bibe, ez bi kurê xwe re bi dezgirtî kirim, lê min jê hez ne dikir, ew jî ji min biçûktir bû, min tim lê dixist û jê re digot, “tu reş î, ez te nakim”.

- Tu wê hîngê çend salî bû?

- got ez nizanim. Ê li jina ku pê re bû vegeerî û bi dengekî nizim got:

- Hîn memikên min çûk bûn, û bi destê xwe meziniya wan da xuyan. Ji xwe em dîsa pir kenîn.

Li ser revandina xwe jî wiha got:

- Şevêkê çend mirov hatin mala me, ez bi zorê ji mal derxistim û bi xwe re birim nav çiyayê ku li dora gundê Qerqîna(bilbil- Efrîn) ye. Dem hêvar bû, mera hevdû nas ne dikir. Lê gava ku mirovek ji wan nêzîk min bû, min got tu kî yî, got ez Menan im. Min ew mirov berî dîti bû, ew mervê diya min bû. Wê hîngê, pîr berkenî bû, û got, min jê re got dîsa rind e, tu Menanî û ne yekî xerîbî.

Jina ku vê re, jê pirsî:

- tu çawa bê nîkeh zewicî?

Pir kenî û got:

- Wî sê kevir danîn û di nav de ez birim, berê nîkeh jina bi wî rengî jî qebûl dibû. Jixwe em dîsa kenîm, û dengê me çû derve.

Li wê navberê, jineke din jî hati bû, zik dêşî û li derve rûnişti bû, mêrê wê hat û ji min re got: Win li vir de dikenin, û li derve jî zikê jinikê dêşe”. Ew mirovekî nas bû, min jê re got: Bi xwedê eger jina te bimre jî, ezê çêroka pîrê ta dawiyê bibîsim..

Min deriyê oda mu'ayenê vekir, û ji pîrê xwest, çêroka xwe ji jina nexwş û ji mêrê wê re jî bêje. Gava ku pîrê çend gotin ji çêroka xwe hewaldan, ew jina nexwş ku ji ber êşa xwe dinalî, êşa xwe ji bîr kir, û ew jî bi me re kenî.

Pişt re, min wêneyek ji pîrê re girt, û min pere jî jê nebirin.



Danehev: Şêrewî

- 1 -

Mamoste ji şagirt pirs kir, hêk nêr e yan mê ye?.

Şagirt got: Bersiva pîrsa te li ser çêlika ku di hundir hêkê de dimîne ... ma gelo ew dîk e, yan mirîşk e?.

- 2 -

Mamoste ji şagirt pirs kir, sûda guhan çi ye ?.

Şagirt got: Ji bo mirov çempilkên berçavkên xwe bi wan ve daliqîne.

- 3 -

Dadger ji diz pirs kir, te çawa zêr dizîn, bê ku kesek te bibîne ?.

Diz got: Bibore ... ez kesekî bêpere fêr nakim.

- 4 -

Mamizê di daristanê de henekek kir, ji bilî kerê hemû ajal kenîyan.

Piştî deh rojan ker kenî, hirçê ji wê pirs kir, tu ji bo çi dikenî ?.

Kerê got: Ez bi heneka mamizê dikenim.

Darên HÊVRIZ Û ERZÊ

**Amamdekirin:
Endezyarê Çandiniyê
M.T.Hemo**

Di rûpela (249) an de ji (Ferhenga Kurdî ya Nûjen) a mamosteyê hêja] Alî Seydo Gewranî) wiha hatiye: (dara Hêvrist = Hevrist , Evris) bi wateya dara العرعر - شجرة الأرز . Lê li gora zanebûna wek endezyarekî çandiniyê, tevlêheviyek di navbera du daran de ji darên daristanê heye, yek ji wan dara (Hêvrizê- Êvirsê, Hêvirsê)ye, ya din jî dara (Erzê)ye. Netenê wilo, her darek ji wan ji malbatekê ye û bi gelek tiştan ji hev cuda dibin. Hêjayî gotinê ye, ku dewletê Lubnanê dara Erzê ji xwe re kiriye sembol û ala xwe ya niştimanî pê xemilandiye. Û ji bo rastî û zanistiyê min xwest ez cudawaziyê di navbera darên Hêvrizê û Erzê xuyan û ji xwendevanan re pêşkêş bikin :

- 1. Bilindiya daran:** - Hêvriz ta 10 mitran bilind dibe.
- Erz jî 25- 40 mitran bilin dibe.
- 2 . Pel:** - Pelên Hêvrizê wekî zirxa ne, 2 xêzên sipî li ser in û dirêjîya wê dora 2 santîmitra ye.
- Lê dirêjîya pelên Erzê 1-3 santîmitra ye, pehinbûn jî milîmek e û pelên xwe kom kom in.
- 3. Çîçek:** - Çîçekên Hêvrizê yên nêr li ser darekê ne û yên mê li ser dareke din in, yanê darên nêr û darên mê hene.
- Lê çîçekên Erzê yên nêr û yên mê li ser darekê ne.
- 4. Ber :** - Berê Hêvrizê hûrik, gilover û sorik e.
- Lê berê Erzê wek hîça ye, dirêjîya xwe 7-10 santîmitra ye û pehniyê wê jî 4-7 santîmitra ye.
- 5. Cîwar û jîngêh:** - Dara Hêvrizê li derdora derya sipî di nav daristanên merxê û sindiyanê de tê dîtin.
- Lê Erz li çiyayên bilind ku di ser 1000 mitrî re dijî, wek çiyayên Toros, Lubnan û E'lewiyan. Dar û textê wê di ser 1000 salî re temen dîke , ji ber wê jî jê re dibêjin (şahê daristanê) .
- 6 . Text:** - Textê Hêvrizê sivik e, ji çêkirina pênûsan re bi kart ê.

- Textê Erzê mekin e, bînxeş e, ji çêkirina malan, qesran û gemiyan re bi kar tê. Erz dareke bejinbilind e, û ji darên xemlê tê jimartin.

Û li jêr min wêneyên û navên herdu daran bi zmanên Kurdî, Erebî û Latînî (zimanê zanistiyê) daniye:

<i>ziman</i>	<i>Hêvriz</i>	<i>Erz</i>
Kurdî	Hêvriz=Hêvrîst=Êvrîs)(Selwezad* =Lewend**
Erebî	(الشربين=الععر=الذاب=العدریش)	الأرز
Latînî	juniperus	cedrus
Malbata darê bi Latînî	Gupressaceae	pinaceae



Dara Erzê li gundê Me'riskê



Dara Hêvriz di navbera gundên Serêkaniyê û Me'riskê

* Selwezad: Ev nav ji devê ji gundê "Kurzêla Cûmê" hatiye birin.

**Lewend: Ev nav ji devê Ehmed Çe'fer hat birin, (şêx Ehmed Çe'fer xwediyê daristaneke taybet bû ji gundê Bafelûnê- Efrîn.

Telqîna Miriyan

Li gor kevnebaweriya mislimanên herêmên me, gava ku mirov dimre, tê şuştin, kefenkirin, binaxkirin û telqînkirin. Telqîn piştî veşartinê li ser gorê ji hêla xoce yan şêxekî olî ve tê kirin.

Telqîn bi xwe lave, gotin û zînine olî ne, li her deverekê û li gor her rêolekê (mezheb), pirhindik ji hev cuda dibin. Lê belê ew bi tevahî di çarçewa zanîna olî ya derbasbûna miriyan bo dinya din de digere. Mebest jê ew e, ku kesê mirî bersiva pirsên herdu pêriyên mirinê (Enker û Nekîr) bi şêweyekî rast bidin, û ol û baweriyên xwe yên mislimantiyê yên jiyana xwe ya dinyayê diyar bike.

Telqîn ne ferza û ne jî sinet e, ew di dema pêxember de tine bû. Loma jî deqeke yeksan û hev girtî ji telqînê re nîne. Lê belê bi tevahî, xwendina wê bûye adeteke cihgirtî, naverok û mebest wê jî li hemî deveran pir nêzîk hev in. Û bi piranî ev du deqên jêrîn tên gotin, telqînek ji mezinan re ya din jî ji zarokan re.

Me ev herdu deq ji pirtûkeke kevin wergirtin û wergerandin Kurmancî. Hêviya me ew e, ku xoceyên me telqîna miriyên me bi Kurmancî bikin. Çima na!? Madam Tirk, Erebb û Ecem erkên xwe yên olî bi zimanên xwe dikin, ma çima emê jî erkên xwe yên olî û di nav de Telqîn bi zimanê xwe nekin!? Nemaze jî ew ji hêla millet ve û ji aliyê olî ve jî tê qebûlkirin, û em bi bawer in jî, ku ew dê cihê razîbûn û spasîyê be jî.

Rozad

Telqîna Miriyan

Ji Xweda pêve ti Xweda tinene, Mihemed pêxemberê Xweda ye.

Ji Xweda pêve ti Xweda tinene, ew bi tenê ye, bê heval e. Arzû ya wî ye, malavabûn ji wî re ye. Ew zindîkar e û dimrîne. Jîndar e, herdemî ye, şiyar e, serdar e, hêzdar e, dadmend e, camêr e, xew nake, namire, çavdêr e, pêdar e, her heye, her xudanê gewrahî û rûmetê ye. Çêxwazî di destê wî de ye, û li ser hertiştêkî serdar e.

Xweda gotiye: ((Her nefsek wê mirinê bibîne, lê winê fêdeya karê xwe li roja qiyametê bibînin, kî ji êgir hat bidûrxistin û kete bihuştê ew serkeftî ye, jîna cîhanê jî tenê tiştê pozbilindiyê ye. Yê li ba we xelas dibe, yê li ba Xweda dimîne. Ji bilî rûyê wî hertiştêk mirdar e, destlat a wî ye, û winê li wî veşerîn. Hertişt li ser zemînê wêranbar e, tenê rûyê Xwedayê te ye gewre û rûmetdar dimîne. Tu mirî yî, ew jî dê bimrin, pişt re winê li roja qiyametê li ba Xwedayê xwe bi rûyê hev kevin)).

Ey evdalê/evdala Xweda kurê evdala Xweda, peyman a ku tu li ser wê ji cîhanê derketî û diçî diyarê axretê bibîr wîne, ew jî şîhadeta:

Ji Xweda pêve Xweda tinene, Mihemed pêxemberê Xweda ye, bihuşt rastî ye, agir rastî ye, mirin rastî ye, gor rastî ye, Munkir û Nekîr rastî ye, pîrskirin rastî ye, bersiv rastî ye, hesab rastî ye, mîzan rastî ye, gunehvedan rastî ye, hewzoyê kewserê rastî ye, lêborîn rastî ye, pira siratê rastî ye, heşîr rastî ye, dîtina bawermendan ji Xweda re di bihuştê de rastî ye, hatina qiyametê bêguman e, Xweda kesên di goran de

تلقين ميت

لا إله الا الله محمد رسول الله،

لا إله الا الله وحده لا شريك له، له الملك وله الحمد يحيي ويميت وهو حي، دائم، قائم، قاهر، قادر، عادل، فاضل، لا ينام، ولا يموت، ولا يفوت، ولا يحول، ولا يزول ابدأ، ابدأ ذو الجلال والاكرام، بيده الخير وهو على كل شيء قدير.

قال تعالى: ((كل نفس ذائقة الموت، وإنما توفون أجوركم يوم القيامة، فمن زحزح عن النار وأدخل الجنة فقد فاز، وما الحياة الدنيا إلا متاع الغرور. ما عندكم ينفد وما عند الله باق. كل شيء هالك الا وجهه، له الحكم وإليه ترجعون.

كل من عليها فان ويبقى وجه ربك ذو الجلال والإكرام. إنك ميت وإنهم ميتون، ثم إنكم يوم القيامة عند ربكم تختصمون.))

يا عبدالله ابن أمة الله، اذكر العهد الذي خرجت عليه من دار الدنيا الى دار الآخرة، وهو شهادة: أن لا إله الا الله وأن محمدا رسول الله، وأن الجنة حق، وأن النار حق، وأن الموت حق، وأن القبر حق، وأن منكرا ونكيرا حق، وأن السؤال حق، وأن الجواب حق، وأن الحساب حق، وأن الميزان حق، وأن القصاص حق، وأن الحوض حق، وأن الشفاعة حق، وأن الصراط حق، وأن الحشر حق، وأن رؤية الله تعالى في الجنة للمؤمنين حق، وأن الساعة آتية لا ريب فيها، وأن الله يبعث من في القبور، وأنتك رضيت بالله ربا واحدا، وبالإسلام ديناً، وبمحمد صلى الله عليه وسلم

vedijîne. Tu jî bi Xweda mîna yek Xweda razî bûyî, Îslam dînê te ye, Mihemed nimêj û silava Xweda lê be jî şande û pêxember e.

Ev warê yekê ye ji warên axretê, û warê dawîyê ye ji warê cihana fanî. Mîna ku Xweda di pirtûka xwe ya hêja û hişmend de gotiye:

((Me win jê afirandin, em we tê de vedigerînin, û careke din jî jê derdixin)).

Niha du pêriyên pîroz ên berdevik ên hesêb dê werin ba te, bila tu jê veneciniqî, jê netirsî, jê bêzar nebî, ew afrande ne(mexlûq in) ji afrandeyên Xwedayê gewre, eger ji te pirsîn:

Kî Xwedêyê te ye? Kî pêxemberê te ye? Îmamiya te çi ye? Ola te çi ye? Qulba te çi ye? Birayên te kîne?.

Bêje: Xweda xwedayê min e, Mihemed pêxemberê min e, Ke'be qulba min e, Îslam ola min e, bawermend û misliman tev birayên min in, ez li ser wê afirî me, li ser wê jiyame, û li ser wê jî mirime. Bi ya Xwedayê gewre tuyê li ser wan jî werî vejandin û tuyê ji dilrihtan bî.

Xweda tu li ser gotina rast rawestandî, Xwedayo tu bi gotina rast wî rawestî, li jiyana cihanê û li axretê Xweda bawermendan bi gotina rast radiwestîne. Ey bora (nefsa) dilrihet, bi dilekî razî û bi razîbûn li Xwedayê xwe vegere, derbas be nava perestvanên min, û têkeve nava bihuşta min.

رسولا ونبياً.

هذا أول منزل من منازل الآخرة وأخر منزل من منازل الدنيا الفانية. كما قال الله تعالى في محكم كتابه العزيز الحكيم:

((منها خلقناكم، وفيها نعيدكم، ومنها نخرجكم تارة أخرى)).

الآن يأتيك الملكان الكريمان الموكلان المحاسبان، فلا يفزعك، ولا يروعك، ولا يهولك، فإنهما خلق من خلق الله تعالى، فإذا سألاك: من ربك، ومن نبيك، وما إمامك، وما دينك، وما قبلك، وما إخوانك؟

فقل: الله ربي، ومحمد نبي، والقرآن إمامي، والكعبة قبلتي، والإسلام ديني، والمؤمنون والمسلمون كلهم إخواني، على ذلك خلقت، وعلى ذلك حبيت، وعلى ذلك مت، وعلى ذلك تبعث إنشاء الله تعالى وأنت من الأمنين.

ثبتك الله بالقول الثابت، اللهم ثبته بالقول الثابت، يثبت الله الذين آمنوا بالقول الثابت في الحياة الدنيا وفي الآخرة. يا أيها النفس مطمئنة، ارجعي إلى ربك راضية مرضية فادخلي في عبادي وادخلي جنتي.

Telqîna Zarokan

Ji Xweda pêve ti Xweda tinene, Mihemed jî pêxemberê Xweda ye. Ji Xweda pêve ti Xweda tinene, ew bi tenê ye, bê heval e. Arzû ya wî ye, malavabûn ji wî re ye. Ew zindîkar e û dimrîne. Jîndar e, herdemî ye, şiyar e, serdar e, hêzdar e, dadmend e, camêr e, xew nake, namire, çavdêr e, pêdar e, her heye, her xudanê gewrahî û rûmetê ye. Çêxwazî di destê wî de ye, û li ser hertiştêkî serdar e.

Xwedawo, ev zarokê ku hîn hişdar nebûye, pênuşan li ser nekirine, şaşî û guneh wernegirtine, te bi dilovaniya xwe afirand û bi vîna xwe mirand, ew jî ji perestvanên te yên çê bû, Xwedawo tu wî ji dê û bavê wî re bikî pêşber, sermiyan, hişdarî, 'ibret, lêborvan û lêborxwaz. Xwedawo tu bi wî qezenca wan giran bikî, pileyên wan bilind bikî, û tebatê bi ser dilên wan de berdî. Xwedawo ta dema dê û bavê wî dikevin bihuştê, û dilxwaziyên xwe bidest dixin tu wî li ber deriyê bihuştê xwe bikî bendewar.

Gelî amadeyan, dilovaniya Xweda li we be, Xweda qerqodeyên me û we bigihîn cihê herî bilind, sewaba seabirdaran bike para me, û Xweda li gunehên me û we tevan bibore.

Xwedawo tu li miriyên bawermend û li hemî mislimanan boborînî. Xwedawo tu gorên wan ron û bi ronahî, fereh û bi şahî, rûgeş û dilşa bikî, û li xelkê goristanan biborînî. Tu paşa yî, Xweda yî, lêbordarî, dilovanî, lava wan di goran de bi navê te ye, bixêrhatina wan silava aştiyê ye, lava wan a dawîn jî ev e: Mala Xwedayê tevahiya gerdûnê ava.

تلقين طفل

لا إله إلا الله محمد رسول الله. لا إله إلا الله وحده لا شريك له، له الملك، وله الحمد، يحيي ويميت، وهو حي، دائم، قائم، قاهر، قادر، عادل، فاضل، لا ينالم، ولا يموت، ولا يفوته شيء، ولا يحول، ولا يزول، ابداء، ابداء ذو الجلال والاکرام، بيده الخير وهو على كل شيء قدير.

اللهم وهذا الطفل الذي لم يبلغ الأحلام، ولم تجر عليه الأقدام، ولم يكتسب الخطايا والآثام، خلقتة برحمتك وتوفيقته بإرادتك، وهو من عبادك الصالحين، اللهم اجعله قرطاً لأبويه وسلفاً، وذخراً، وعظة، واعتباراً، وشافعاً، ومشفعاً لهم، وثقل اللهم أجرهما، وارفع به درجاتهما، وأفرغ الصبر على قلوبهم. اللهم اجعله مهبطاً إلى باب جنتك حتى يدخل أبواه فيها وينال ما يتمنيانه.

يا معشر الحاضرين رحمكم الله، جعل الله حطامنا وحطامكم في أعلى عليين، وأثابنا وإياكم ثواب الصابرين، وغفر الله لنا ولكم أجمعين.

اللهم اغفر لأهل القبور من المؤمنين والمؤمنات، والمسلمين والمسلمات أجمعين، واجعل اللهم في قبورهم الضياء والنور، والفسحة والسرور، والبهجة والحبور، والمغفرة على أهل القبور. إنك ملك رب غفور رحيم، دعواهم فيها سبحانك اللهم وتحيتهم فيها سلام وآخر دعواهم أن الحمد لله رب العالمين.